Kurdportal çi ye û çi dixwaze?

Em navê rojnameya elêktronî yan jî rojnameya înternêtê ku li welatên dinyayê û bi zimanê ingilîzî "Online Newspaper" jê re tê gotin, bo Kurdportalê bikartînin û li gorî karînên xwe, rojane bi belavkirina nivîsên rojnamevanî wê nû dikin. Nûçe yên Kurdistanê û Cîhanê digehînin xwendevan û mêvanên Kurdporalê. Boçûn, Komêntar û Şirove yên nivîskaran dikarin ciyê xwe di nav malperî de bigirin. Armanc û hêviya me gehandina zaniyariyane.

Rûdan û bûyerên çê dibin, wek xwe bêyî guhertin li ber destê xwendevanên xwe yên birûmet didanîn û xwe wek aliyek wan nabînin. Aliyê ku em digirin, gehandina zaniyariyan û agehdarkirine. Agehdariyên li ser hemû biyavên jiyanê, siyasî, civakî, aborî, zanistî, werzişî, hunerî û rewşenbîrî...htd. Jiber Kurdportal malpereke serbixwe ye û negirêdayî çi rêbaz û hizirên siyasî, olî û baweriyan ne loma jî em rêz li hemû dîtin û nerînan digirin û rênadine xwe dinav nivîsên Kurdportalê de bêhurmetî û bêrêzî li hemberî sembolên olî û netewayetî yên xelkê Kurdistanê bên kirin.

Her karekê nû kêmasiyên xwe hene, ev awayê rojnamevaniyê jî; rojnamevaniya înternêtê "online journalism" li nav me kurdan ta radeyekî nû ye, bivê yekê jî em bawer dikin ku kêmasiyên me jî dê hebin. Jibo rexine, pêşniyaz û têbîniyên we em ji niha ve sipasiyên xwe tînin ziman. Her dîsan daxwazê ji rojnamevan û nivîskarên hêja dikin, malperê me bi hinartina nivîsên xwe xemlîn biken

www.kurdportal.net
info22@kurdportal.net